Kurmanji – Kurmancî

Sîgorta tenduristiyê Audio

Silav. Navê min ... e û ez ji kantona bajêr ya Baselên gihiştim zanyariyên fermî. Ev qeydê deng di derheqê sîgortaya tendirustiyê ye. Ez ê ji we re zanyariyên li ser awayê xebitîna sîstemê, berhevkirina pere û cihê ku alîkarî were girtin bidim.

Li Swîsreyê divê herkes di şîrketeke tendirustiyê de xwedî sîgortayeke bingehîn be. Ev, ji bo peredayîna mesrefên doktor, derman û nexweşxaneyê alîkar dibe. Hûn dikarin sîgortaya zêde jî bikin. Ev li gor daxwaza we ye û destheqekî zêdetir dixwaze.

Lêbelê, ev qeydê deng ne li ser sîgortaya zêde ye, tenê li ser sîgortaya bingehîn e. Hûn dikarin sîgortaya bingehîn bi rêya şîrketeke sîgortayê pêk bînin. Li Swîsreyê gelek şîrketên cihê yên sîgortaya tendirustiyê hene. Ji bo sala bê hûn dikarin heta 30ê çiriya paşîn sîgortaya xwe ya tendirustiyê biguherînin.

Tevahiya sîgortayên tendirustiyê eynî sîgortaya bingehîn pêşkêş dikin. Lêbelê dibe ku bihayê wan cihêtir be. Ev sîgortaya tendirustiyê girêdayî tu tiştan e. Modela û franchisea ku hatiye hilbijartin Ji ber vê divê hûn bihayê wan miqayese bikin. Ji bo heqê sîgortaya tendirustiyê prîm tê gotin.

**Model çi ye?**
Ji bo sîgortaya bingehîn bu modelên cihê yên sîgortayê hene. Model wê yekê dibêje ku gava hûn nexweş dibin divê ewil herin kuderê. Li gor modelê, prîm dibe ku hinekî din erzantir be. Wek mînak, her tim ewil hûn ê biçin ba doktorê xwe yê malbatê. An jî di modeleke din de, her tim ewil hûn ê biçin ba doktorekî pispor. Bi vî awayî hûn zêde pere xerc nakin. Hûn dikarin modela xwe her sal heta 30ê çiriya paşîn di şîrketeke sîgortaya tendirustiyê de biguherînin.

**Franchise çi ye?**
Franchise, ew mîqdarê pere ye ku divê hûn bidin. Hûn ê vî pereyî ligel mesrefên sîgortaya tendirustiyê, bi ser de bidin.  Ji bo her sîgortaya bingehîn hûn dikarin di navbera300  û2500 de franchise hilbijêrin. Wek mînak, eger franchise' a we300 frank be û dema ku hûn diçin ba doktor hûn ê 300 frank bidin. Şîrketa sîgortaya tendirustiyê mesrefên ji 300 frankî zêde bide. Lêçûnên sîgortaya tendirustiyê ,ango prîmeke 2. 500frankî  li gor franchiseke  300frankî bihatir e .Li gel vê kesên ku perê wan zêde tune ye, franchiseke 300 frankî baştir e. Ango di dema

nexweşiyê de rîska deyn kêmtir e.  Hûn dikarin heta30ê çiriya paşîn franchise jî di şîrketa sîgortaya tendirustiyê de biguherînin.

**Daxistina prîmê çi ye?**

Li Swîsreyê ji bo gelek kesan prîm gelek biha ne. Ji ber vê prîm tên daxistin. Daxistina prîmê tê wê maneyê ku kanton beşeke fatureya we ya prîmê ya şîrketa sîgortaya tendirustiyê dide. Bi vî awayî hûn ê kêmtir pere bidin. Ma hûn jî dikarin sûd ji daxistina prîmê werbigirin? Ev yek girêdayî dahat û heyînên we ye. Ji bo daxistina prîmê divê hûn serî li kantonê bidin. Hinekî şûnde ez ê li ser zanyariyên zêde yên daxistina prîmê lînkekê ji we re bişînim.

Sîstema sîgortaya tendirustiyê li Swîsreyê tevlihev e. Eger hewcedariya we bi alîkariyê hebe, tîma GGG Migration dê alîkariya we bike. Şêwirmend bi zimanên cihê dizanin. Ji bo hevdîtinê hûn dikarin telefonê vê hejmarê bikin: 22 92 206 061.

Silav û rêz...

-Şêwirmendiya GGG Migration: Bi 14zimanan şêwirmendî| GGG Migration (ggg-migration.ch)

Basel – Daîreya Tevkariyên Civakî Yên Kantona Bajêr: Daxistina primê (bs.ch)